# ÎRAQ | IRAQ

TIER 2

Encumena Azadîya Dînî ya Navneteweyî ya DY (USCIRF), encûmeneke hikûmeta federal a DY-yê ya cotpartîyîyî ya azad e ku bi Qanûnê Azadîya Dînî ya Navneteweyî (IRFA)ya 1998ê sazkirî ye û çavdêrîya mafê azadîya dînî û bawerîyê ya cîhanî ya derveyê welêt dike. USCIRF ji bo çavdêrîya binpêkirinên azadîya dînî û bawerîyê standardên navneteweyî bi kar tine û ji Serekê Dewletê re, Wezîrê Karên Derve re û Kongresê re pêşnîyarîyên siyasî pêşkêş dike. USCIRF dezgeheke azad e ku ji Wezîrîya Karên Derve cuda tevdigere. Raporta 2019ê ya Çalakîyê bibelgekirina binpêkirinên li ser rûyê cîhanê û ji alîyê pêşnîyarîyên siyasî yên azad ji bo hikûmeta DY ve karên salekê ya koma profesyonel û Endamên Encûmenê bi awayekî herî bilind eşkere dike. Raporta 2019ê ya Çalakîyê, dewra nava Çileyê Paşîn ê 2018ê heta Çileyê Pêşîn ê 2018ê dixe nava xwe, lê di hin rewşan de bûyerên giring ên piştî vê dewrê jî dixe nava xwe. Ji bo zanîna bêtir a li ser USCIRF-ê hûn dikarin ji vê derê serdana sîteya înternetê bikin yan bi rêya jimara 202-523-3240ê ya têlefonê yekser xwe bigihînînê.

**Îraq**

**Bidestketîyên Hîmî:** Di 2018ê de di warê azadîya dînî ya Îraqê de teşqeleyên pirr ciddî rû dane û di asta navîn de li wê derê meyla çêtirbûnê bi şikestinî hatiye dîtin. Hikûmeta Îraqê di mijara parastina ewlehîya kêmanîyên dînî û nîjadî de dilnexwazî û bêhunerîya xwe dewam kiriye. Ji Mislimanên Sinnî û endamên malbatên wan ên bi destekdayîna Dewleta Îslamî ya Îraqê û Şamê tên gunehbarkirin re proseya qanûnî pêk neanîye û herweha sînorkirinên azadîya dînî dewam kirine û pêk anîye; wek nimûne qanûnên nehiştina heqareta li dînî û xweşnebînîya fermî ya ji hin komên dînî re. Herweha digel ku serekên herêmî û navneteweyî ji paşîya 2017ê ve têkçûna DAÎŞ-ê diqîrin jî, DAÎŞ, bi sepeyeke navendî re ne wek dewleteke xwedanax lê wek serhildaneke piçûk î wek hicre yî belavbûyî ya di tevahîya dewletê de, hê jî tevdigere. Werçerxîna dezgehê kiriye ku ew jimara tevgerên xwe yên piçûk bêtir kiriye û bi tenê li Îraqê hema hema 15.000 şervanan hê jî di destê xwe de dihêle. Ji bilî van, kêmanîyên dînî û nîjadî yên wek Êzîdîyan û Filehan ên DAÎŞ ji bo tovkujîyê bi taybetî ew ji xwe re kirine mebest, hê jî ji ber neeşkerebûna rewşê li ser veger û venegerîna civata xwe, kûr û dûr diponijin. Li herêmên ji deshilatdarîya DAÎŞ-ê azadkirî û/yan wek Sincarê, Deştên Neynewayê û Kerkûkê yên demeke dirêj e di navbera Birêvebirîya Herêma Kurd (BHK) û Hikûmeta Îraqa Federal (HÎF) de demeke dirêj e sebebê lihevnekirinê ne, ev nezelalî bi taybetî xuya bûye. Di encamê de asta vegera kêmanîyên dînî yên ji axên lê jîyane derkirî ji asta komên Mislimanên Sinnî û Şî'î yên ku di 2014ê de piştî bi bipêşveçûyîna DAÎŞ-ê ji malên xwe revîyayî pirr kêmtir bûye. Rewşa bêtirî 200.000 kesên wek komên Êzîdîyên ji herêma Sincarê derketî jî; pirr kêm ji wan di 2018ê de vegerîyane û pirranîya wan di kempan de li hêvîyê mane ku welatê wan ji nû ve bê avakirin û ewlehî dîsa bê pêkanîn. Di Adara 2018ê de şandeyeke USCIRF-ê ji bo nirxandina rewşa azadîya dînî, hem serdana herêmên ji alîyê HÎF-ê tên birêvebirin û hem yên ji alîyê BHK-ê ve tên birêvebirin kiriye.

USCIRF, li ser vê rewşê, di warê girêdana Qanûnê Azadîya Dînî (IRFA) de li ser binavbûyîna wek "welatê endîşeya siyasî lê heyî" (CPC) de hikûmeta Îraqê di 2019ê de ji ber çavgirtin yan pêkanîna binpêkirinên azadîya dînî ya wek yek ji hêmanên standardê "sîstematîk, dewamkirî, tirsnak" dîsa dixe Asta 2yê. USCIRF, ji bilî vê yekê, di dewra raportkirinê de ji ber ku DAÎŞ êdî di nava Îraqê de ne xwedîya "hêzeke siyasî ya giring û kontrolkera axê" ye, ev dezgeh bi awayê ku di IRFA-yê de di Çileyê Pêşîn ê 2016ê de guherandî de binavkirî ye, li ser binpêkirinên azadîya dînî ya gelek dijwar hatiye dîtin ku mercên "dezgeha endîşedêr a taybet" (EPC) pêk neanîye. Lêbelê USCIRF dîsa jî li Sûrîyeyê ji ber kontrola herêmî û tevgerên wê, difikire ku DAÎŞ vê binavkirina fermî bi cîh tîne û herweha pêşnîyar dike ku ew wek EPC bê binavkirin.

**Ji Hikûmeta DY re Pêşnîyarî**

- Qismen li gora Qanûnê Berpirsîyarîya Azadkirin û Berpirîyarîya Tovkujîya Îraq û Sûrîyeyê ya 2018ê (P.L. 115-300) ji bo pêkanîna vegerîna komên ku ji cîhên xwe derketine û bêparastin in, û komên din ên ku perçebûna wan a dînî û nîjadî ji alîyê DAÎŞ-ê ve bi xerabî tên bikaranîn, dermankirina herêmên ji kontrola DAÎŞ-ê azadkirî û ji bo îstîqrara wan bileztirkirina belavkirina alîkarîya DY;

- Ji bo bi rêyeke aştîyanî teşwîqkirina çareserkirîna teşqeleyên HÎF-ê û BHK-ê yên wek keysa pêkanîna vegera komên koçber tevlî kêmanîyan, lihevnekirinên budceyê, lihevnekirinên petrolê, û pêkanîna Madeyê 140î yê qanûnê esasî yê Îraqê biderengîketinên ev demeke dewam dikin û rê li ber çareserkirina gefa DAÎŞ-ê digirin;

- Ji bo nehiştina ji alîyê hêzên desthilatdar ve destdanîna ser xanî û malên kêmanîyên dînî û nîjadî teşwîqkirina hem HÎF-ê û hem BHK-ê û ji bo çareserkirina lihevnekirinên milkan ên di nava koman de demeke dirêj e dewam dikin destekkirina avakirina çarçoveyeke bikêrhatî ya qanûnî û awayên din ên alîkarîyê; û

- Di hemû alîkarîyên eskerî û yên ewlehîyê yên ji bo HÎF-ê û BHK-ê de di mijara cûrbicûrbûna dînî û nîjadîya welêt de şertdanîna pêkanîna tevlîbûna bitemamî ya hêzên ewlehîyê û ji beşên sitandî re li ser standardên mafên mirovan ên navneteweyî û ji bo awayê tevgera di serî de bi kêmanîyên dînî re û bi sivîlan re hînkirina wan.

Kongresa DY divê:

- Destekkirina bernameya bi mebesta pêdankirinên li ser di serî de Eshabul Ehlul Heq û Hereketa Hîzbullaha Elnucebaya bi komên bi Îranê ve girêdayî yên Hêzên Seferberîya Gelî (HSG) ya ku hem li Îraqê û hem li Sûrîyeyê tundîya mezhebî pêk anîye û li hemûyê

Îraqê bi serektîya hikûmetê têkoşînên ji bo dîsa avakirina ewlehîyê û îstîqrarê zehmettir kiriye.

**Serbuhurî**

| |
|---|
| **Îraq** |
| **Navê Temamî:** Komara Îraqê |
| **Hikûmet:** Komara Parlamenter a Federal |
| **Nifûs:** 40.194.216 |
| **Dîn/Bawerîyên ji alîyê Dewletê ve Naskirî:** Îslam, Filehî, Sabîîtî-Mandeîtî, bawerîya Bahaîyan, Zerduştî, Bûdîzm, Hîndûîzm, Cihûtî û dînê gelêrî |
| **Demografîya Dînî *:** |
| %95–98 Misliman (%64–69 Şî'î, %29–34 Sinnî) |
| %1 Fileh |
| %1< Yên din (tevlî Îzîdîyan, Sabîî-Mandeîyan, Bahaîyan, Zerduştîyan, Bûdîstan, Hîndûyan, Cihûyan û endamên dînên gelêrî) |
| *Texmîn ji Pirtûka Rastîyên Dinyayê ya CIA-ê û Wezîrîya Derve ya DY hatine sitandin. |

Îraq di seranserê dewra raportkirinê ya 2018ê de her bi zehmetîyên ciddî re rûbirû maye. DAÎŞ xwe parastiye û êdî wisa xuya ye ku di demeke nêz de dev ji tevgerên xwe yên pêkanîna kontrola yekser a ser axa Îraqê berdaye. Lêbelê bi qasî 20-30.000 şervanên wan ên li Îraqê û Sûrîyeyê belavbûyî, dibe ku xwe ji şerkirina şerê berfireh ê bi Îraqê, Kurdan yan hêzên navneteweyî dûr dikin û wek strategîyeke demdirêj ji bo dewamkirina hunerên xwe yên tevgerê kar dikin û bi awayê êrîşên piçûk vegerîyane ser awayê xwe yê berî 2014ê. Li gora komên ku bidestketîyên şerkirinê bibelge dikin, ev awa kiriye ku DAÎŞ di seransera 2018ê de her meh li Îraqê hema hema bi kêmayî 75 êrîş pêk tînin û ji alîyekî din ve jî nemaze li herêmên ku hêzên ewlekarîyê li wan herî kêm in, binakokî ne yan birêvebirîya fermî li wan tune ye piçûk bûye lê dîsa jî bi awayekî xuyayî hebûna xwe dewam kiriye. Bi awayekî kin, DAÎŞ bi awayekî demkî xwe veşartiye lê ji dema di 2014ê de derketina meydanê ve, bi xweşnebînîyeke hovanî li bakurê Îraqê di serî de komên kêmanîyên bêparastin ji xwe re kiriye mebest û ji bo çendîn mirovan hê jî gefeke giran û nêzîk e.

Hin bûyerên li hin herêmên din ên welêt jî tevgerên bi temamî tunekirina gefa DAÎŞ-ê zehmettir kiriye. Komên cûrbicûr ên rêya wan di yek cîhî de derbas dibe li herêmên binakokî yên bakurê Îraqê ji bo desthilatdarîyê hê jî reqabetê dikin: hêzên Pêşmergeyên Kurd, HSG-a Îran wê destek dike, li Sûrîyeya cîran Yekîneyên Parastina Gel (YPG) a Kurd û Hêzên Ewlekarîyê yên Îraqî (HEÎ). Li herêma Besraya başûr di encama protestoyên berfireh ên Temûz û Îlona 2018ê yên li dijî gendelîyê, xizmetên netêr ên dewletê û bandora Îranê de hikûmet hebûna HEÎ ya li wê herêmê bêtir kiriye, tevgerîyaye ku li ser komên herêmî yên HSG-ê desthilatdarîya xwe eşkere bike. Ev tevlîhevîya sivîl di nava Şî'ayê de bûye sebebê gefeke şerê hundirî û ev awa têkoşînên sepeyê yên hem ji bo tunekirina DAÎŞ-ê û hem ji bo dîsa pêkanîna ewlehîya bakur zehmettir kiriye. Lêbelê di dema paşîn a raportkirinê de ev tevlîhevî bi pirranî sar bûbû.

Di vê navberê de piştî giştpirsîya azadîyê ya BHK-ê ya ya 2017ê HÎF Kerkûk û hin cîhên din bi dest xist digel ku tengijîn bi awayekî demkî kêmtir bû jî, hikûmeta Îraqê di Gulana 2018ê de û BHK jî di meha Çirîya Pêşîn de hilbijartinê li dar xistiye û ji bo her du desthilatdarîyan jî bûye nûnertîyeke serektîyê û parlemantoyê. Di paşîya 2018ê de ji ber ku bazarên parkirina hêza navendî hêdî bi rê ve diçû çendîn textên her du hikûmetan jî vala mane û ev jî dîsa peydakirina ewlehîyê, proseya ji nû ve avabûna piştî DAÎŞ-ê û mercên azadîya dînî ya Îraqê û keysa lêgerîna çareserîyên dem dirêj ji bo teşqeleyên herî zehmet, hê zehmettir kiriye.

Digel van zehmetîyan, di têkoşînên ji bo pêdivêyên giring ên mirovahîyê yên komên Îraqê yên herî bêparastin ên di binê gefê de hin bipêşveçûn rû dane. Di meha Gulanê de António Guterres-ê Sekreterê Tevahîya Neteweyên Yekbûyî, Karim Asad Ahmad Khan-î wek Şîretkarê Taybet û Serekê koma lêkolîna bi pêkanîna [Biryara Jimara 2379ê ya Encûmena Ewlehîya NY] wezîfedar kiriye. Ev biryara bi tarîxa 2017ê destûrê daye komeke lêkolînê ku ew li Îraqê delîlên sûcên şerî yên DAÎŞ-ê yên li Îraqê, sûcên li dijî mirovahîyê yan jî çalakîyên tevgerên tovkujîyê kom bikin û tomar bikin ku DAÎŞ-ê bikin berpirsîyarê wê. Kom, paşê di serê 2019ê de dîyar kiriye ku ew pîlan dike li Îraqê dest bi çalakîyên qadê bike.

Tevlî vî awayî, rêya herî baş a têgihîştina van hemû mijarên li jorê dîyarkirî ew e ku mirov li wan, li gora tengijîna mezhebî û tundîya ev 15 sal in li Îraqê demeke dirêj e dewam dikin û bi awayekî neyînî bandora wan li ser mafên mirovan û rewşa azadîya dînî heye, binihêre. Ev rewşa mezhebperest a li Îraqê alîkarîyê kiriye ku di 2014ê de li bakur û nava Îraqê DAÎŞ peyda bibe û digel ku ev dezgeh wek hêzeke dagîrker di 2017ê de têk çûye jî, heman rewş di 2018ê de dewam kiriye. Di encama heml û meyla Sedam Hiseyînê serekdewletê berê ya ji bo Mislimanên Sinnî û heml û meyla Nurî Elmalîkîyê serekwezîrê berê ya ji bokesên Mislimanên Sinnî de di nava her du komên dînî yên herî mezin ên welêt de perçebûyîn û bêewlehîyeke mezin peyda bûye. Ev tengijîn di nava zemanî de hinbihin bêtir bûne. Digel ku Heyder Îbadîyê serekwezîrê berê xwastiye siyasetên mezhebperest ên berî xwe piçek biguherîne jî, di seransera dema wezîfedarîya xwe ya çar salan de di civata Îraqê de di çareserîya van tengijînên dewamkirî yên dezgehên dewletê û hêzên ewlekarîyê de gelek hindik bi ser ketiye. Ji ber ku hikûmet ji Mislimanên Şi'î pêkhatî ye, kesên Mislimanên Sinnî ewle nabin ku ew civata wan biparêzin yan di hikûmetê de cîh bidin wan jî; heman tişt ji alîyê berevajî ve ji bo Mislimanên Şî'î û ramanên wan ên li ser Mislimanên Sinnî jî di rewacê de ye; Şi'î guman dikin ku Sinnî di proseya desthilata kurt a DAÎŞ-ê de yekser yan bi awayekî veşartî bi çi awayekî be wê destek kirine, yan jî bi awayekî eşkere wan gunehbar dikin.

Herweha, tevlî komên Êzîdî û Fileh, kêmanîyên dînî ji dilxwazîya parastina hikûmeta Îraqê biguman in ku ew wan ji tundîya hêmanên mezhebperest ên tevlî DAÎŞ û HSG-a komên çekdar ên Şî'î û Sunnî ji dil biparêze û xwedanhuner e; hikûmeta Îraqê hê jî serfiraz nebûye komên HSG-ê yên mezhebperest bixe nava avahîya fermandarîya HEÎ-yê yan jî vê naxwaze. Digel ku hikûmeta Îraqê ji 2017ê ve bi taybetî li Wîlayeta Neynewayê hinbihin bêtir destekê dide mafên

kêmanîyan jî digel ku BHK ji komên kêmanîyên ji cîhê xwe dûrketî re keysa bextxwazîya piçek ewletir pêşkêş kiribe jî pirranîya van koman ne bawer in ku azadîya dînî û mafên mirovan pêşîktîya serektîya Îraqê ye.

**Rewşa Azadîya Dînî ya 2018ê**

***Cîhguherandina Demdirêj a Kêmanîyên Dînî:*** Berî bipêşveçûyîna DAÎŞ-ê ya sala 2014ê jî tevlî Katolîk, Filehên Ortodoks, Protestan, Êzîdî û Sabîî-Mandeîyan, komên dînî yên herî piçûk ên Îraqê jixwe gelek piçûk bûbûn û jimarên wan di çar salên paşîn de hê piçûktir jî bûye. Îraq, nemaze di 15 salên paşîn de xetera xwe ya jidestdayîna koma kevn a Filehan heye. Li gora serekên Fileh, berî sala 2003yê li Îraqê jimara Filehan hema hema 1.4 milyon bû lê niha di binê 250.000î de ne. Her çend serekên Fileh ên dînî yên navneteweyî û dezgehên wan ji bo mayîna wan teşwîqa Filehên Îraqê kiribin jî, gelek ji wan ji welatê xwe yê bakurê rojavayê Îraqê yê kavilbûyî hê jî revîyayî ne. Di vê navberê de serekên Êzîdî tevlî bêtirî 3.000 kesên di 2014ê de ji alîyê DAÎŞ-ê ve revandî û cîhê wan nayê zanîn jî tê de, dibêjin ku jimara koma wan li dora 400-500.000î ye, jimara koma Kakaîyan jî ne bêtirî 300.000î ye. Dibe jimara Sabîî-Mandeîyan di nava 1.000-2.000î de be, jimara Bahaîyan kêmtirî 2.000î ye.

Êzîdîyên di destpêkê de di nava 2014ê de li herêma Sincara Wîlayeta Neynewayê rastî tevgerên DAÎŞ-ê yên tovkujîyê hatine hema hema bi temamî dev ji axa bav û kalên xwe berdane û pirranîya wan li Dihokê di kempên bextxwazan de dijîn û hin ji wan li serê Çîyayê Sincarê di konên xerabe de hatine bicîhkirin. Di paşîya dewra raportkirinê de li bajar û gundên herêma Sincarê hema hema hîç nûkirinek nehatiye kirin û avahîyek nehatiye avakirin, ji ber reqabeta kontrola eskerî ya HSG-ê, YPG-a Sûrîyeyê, Pêşmergeyan û hêzên HEÎ-yê, rê li ber pirranîya tevgerên avakirina îstîqrarê yên wek ji nû ve avakirina xanîyên wan, jêravahîyan, karxaneyan û cîhên perestinê hatiye girtin.

Filehên Asûrî û Keldanî yên kêmjimar vegerîyane malên xwe yên Deşta Neynewayê; wek nimûne li Qereqoşê Asurî ji 2014ê ve cara pêşîn Paskalyayê pîroz kirine. Lê pirranîya wan hê venegerîyane; ji ber nûnekirina jêravahîyê, kemînên veşartî yên DAÎŞ-ê û xetera çekên neteqîyayî û tirsa ji nû ve xurtbûna DAÎŞ-ê nehiştiye gelek bextxwazên Fileh vegerin Mûsilê û gundên dora wê. Di dema serdana USCIRF-ê ya di Adara 2018ê de nûnerên hikûmetê û koma navbuhurî, vê endîşeya xwe ya ewlehîyê dîsa bi lêv kirine.

Digel ku kêmanîyên dînî û nîjadî bi mijarên zehmetîyên herî dramatîk ên li jorê dîyarkirî rû bi rû ne jî, rêzeke astengîyên didoyê ya din a demek vê civata gelek zindî bûye xerakiriye jî heye. Hin ji van astengîyan bi bandora kempeyna şiddeta DAÎŞ-ê ya dewam dike ve têkildar e: Wek nimûne; dema ku şervanên DAÎŞ-ê di 2016 û 2017ê de bi paş ve vekişîyan, li herêma bakurê rojava jêderên çendîn komên çolê yên çandinîyê tune kiribûn, bîran, baxçeyên mêweyan û jêravahîyê rûxandibûn. Ji ber vî awayî li wê herêmê, ji bo vegera gundên bi pirranî Êzîdî ne

jêderên debarê gelek kêm in. Di vê navberê de bi sedan jinên Êzîdî yên serbestberdayî niha bi hin bijartinên dijwar re rûbirû ne; ji ber ku di dema dîlbûnê de ji ber destdirêjîyên cinsî yên endamên DAÎŞ-ê Xwedê zarok dane wan. Digel ku serekên ‘adetî yên koman israr kirine, gotine ew dikarin vegerin malê jî, bi sedan zarokên ku bavên wan tovkujîyê kirine û xwîyna wan yek in, nayên qebûlkirin civatê. Tevlî vî awayî, ji ber gendelîyên dewletê yên bi salan e dewam dikin û jêderên avên Îraqê hatine îhmalkirin; çendîn Sabîî-Mandeîyên ku ji bo merasimên wan ên perestinê ji wan re ava paqij divê, ji welatê xwe yê ‘adetî yê Îraqê dûr ketine û koçberî herêmên kêmqirêjî yan bi temamî koçberî derveyê Îraqê bûne.

***Binpêkirinên DAÎŞ-ê:*** Digel ku Îbadîyê serekwezîrê berê di Çileyê Pêşîn ê 2017ê de gotibû ew bi Hevkarîya Cîhanî ya li Dijî DAÎŞ-ê ya bi serektîya DY hemûyê axa xwe bi temamî ji DAÎŞ-ê paqij kirine jî, bermayîyên DAÎŞ-ê yên di 2018ê de revîyayî û xweveşartî li gelek cîhên welêt tevgerên çekdar ên piçûk, kuştin û êrîşên teqîner pêk anîne. Di nava mebestên DAÎŞ-ê de sepeya Îraqê û hêzên polêsan (hem li qada şerî hem jî li malên wan); cîhên kontrola HSG-ê û guzergehên dewrîyeyê; li herêmên bajarî yên bakurê Îraqê jî cîhên sivîl lê ne; yên wek bazaran û xwaringehan filan hene. Tevlî ku ev êrîş wek êrîşên bi ser mebestên eskerîyê û heyfsitandina ji endamên komên Mislimanên Sinnî û Şîî jî ve ne jî DAÎŞ nîşan dide ku ji bo dewamkirina ji nû ve birêxistinbûnê û sûcên xweşnebînîyê û şiddetê û tovkujîyê li dijî Mislimanên Şî’î, Êzîdîyan, Filehan û yên din ên ku ew wek neyar dibîne xwedîjêderên têr, hunerê û motîvasyonê ye.

Serê welêt, bi mîrasê DAÎŞ-ê yê tundîyê bi çendîn awayên din jî hê jî ketiye teşqeleyê. Ji 6.400 Êzîdîyan bêtirî 3.100 ji wan ên DAÎŞ ew di 2014ê de dîl girtibûn, dibe ku hê jî li axa hindik a komê ya Sûrîyeyê dîl bin. Di heman demê de bi rêya têkoşînên fermî û sivîl, gorrên komî yên tevlî qurbanîyên Êzîdîyan, sivîlên Mislimanên Şî’î û eskerên HSG-ê jî hê jî tên derxistin meydanê. Di Çîrîya Paşîn a 2018ê de Neteweyên Yekbûyî bi ser 202 goristanan vebûye, ku 95 ji wan li Wîlayeta Neynewayê û yên mayî jî li Kerkûk, Selahedîn û Enbara demekê di deştê DAÎŞ-ê de bûn. Li gora ku tê gotin, di hin ji wan tirban de laşên hindik wek heşt laşan hene û hin ji wan jî ji çalên ji hezaran laşan pêkhatî ne û bermayîyên hema hema 12.000 qurbanîyan di wan tirban de ne.

***Binpêkirinên Dewleta Îraqê:*** Wek sala berê, piştî ku Mûsil ji destê DAÎŞ-ê hat sitandin, gumanên kûr ên hikûmeta Îraqê û HEÎ-yê li ser Mislimanên Sinnî dewam kirine. Hikûmeta Îraqê destûra vegera malê nedayê malbatên ku ji têkilîyên wan û DAÎŞ-ê gumanbar e, hin ji wan li “kempên malbatên DAÎŞ-ê” bi cîh kirine. Çavdêrên navneteweyî, piştî çend mehên ku Mûsil di dawîya 2017ê de bi destê Îraqê û hêzên navneteweyî bi paş ve hat sitandin, di nava sala 2018ê de li nava bajêr û dora wê hê jî îsbatên ser înfazkirina bêdadgehkirina Mislimanên Sinnî dîtine. Di vê navberê de di seransera sala 2018ê de ji jêderên cuda hatiye haydarbûyîn ku dadgehên sizadayînê yên Îraqê ji ber yekser tevlîbûna yan jî destekkirina DAÎŞ-ê bi hezaran Mislimanên Sinnî zûzûka wek sûckirî qebûl kiriye û bêyî proseya dadgehkirina guncaw û guh nedaye îsbatan (hema hema %98ê dadgehkirîyan sûckirî hatine qebûlkirin). Sebebên civatî, dînî û îdeologîk ên

derketina DAÎŞ-ê tevlîhev û cûrbicûr bûn û dibe ku karîn û hunera dadgehên Îraqê têra her gumanbarî nedikir. Digel vî awayî jî, hikûmeta Îraqê di 2018ê de ji bo dewreke xwebexşîya buhurînê ya destekkirina serdestîya hiqûqê û avakirina çarçoveya lihevkirineke ku vegera kohr a şiddeta mezhebî gelek kêm têkoşaye. Serekên herêmî, çalakvan û nirxînerên navneteweyî gotine ku divê hikûmeta Îraqê ji bo nehiştina ji nû ve xurtbûna DAÎŞ-ê yan jî awayên tundîyên din ên mezhebî divê gazinên Sinnîyan çareser bike.

***Mijarên Din ên bi Dewleta Îraqê ve Têkildar:*** Hilbijartinên neteweyî yên hikûmeta Îraqê yên Gulana 2018ê bi her çend kaşekaş be jî bi awayekî bi pirranî aştîyanî ya Serekwezîrîya Adil Ebdulmehdîyî û derbasbûneke birêvebirîyeke Berhem Salihê Serekdewlet encam da. Her du serek ji alîyê gelek kesan ve wek bijareyên bêtir lihevkir hatine dîtin û welêt ji siyasetên mezhebperest ên eşkere yên Nûrî Malîkîyê di nava salên 2006-2014ê de serekwezîrîyê kir û hikûmeta navendparêz a Heyder Îbadîyê ku dema karkirina wî bi pirranî bi gefa DAÎŞ-ê buhurî hinek din jî dûr kir. Wek nîşaneke hikûmetê ya ku hikûmet guh dide nirxandinên navneteweyî yên bêtirbûyî yên li ser rewşa kêmanîyên dînî û nîjadî, di Çileyê Pêşîn ê 2018ê de Hikûmet, ji bo şerefa pîrozkirina Noleta Filehên Îraqê tarîxa 25ê Çileyê Pêşîn wek rojeke bêhnvedana neteweyî dîyar kir. Ji bilî van, Dadgeha Federal, di Çileyê Paşîn ê 2018ê de biryar da ku divê nûnertîya Êzîdîyan a parlamentoyê ji yek kursîyî bê derxistin pênc kursîyan û li gora nifûsa vê komê bên xuyandin. Lêbelê parlamento berî hilbijartinên 2018ê vê qaydeyê pêk neanîye. Ev nûnertî, ji alîyê serekên kêmanîyên dînî û nîjadî ve di dema serdana USCIRF-ê ya Adara 2018ê de yek ji mijarên giringtirîn bû.

Digel guherîna desthilata welêt a xuyayî û nexuyayî, teşqeleyên sîstematîk ên bi rewşa azadîya dînî ya Îraqê ve têkildar in hê jî hene. Digel ku xeberên wek li Wîlayeta Neynewayê bi awayê neqanûnî destdanîna ser milkê bêtirî 300 Filehan û tomarkirina wan li ser kesên din belav bûne jî, hikûmet, ji îddî’ayên wek piştî bi awayekî demkî ji alîyê DAÎŞ-ê ve guherandina cîhên wan bi awayekî ne qanûnî destdanîna ser axa wan re çavê xwe girtiye. Di warê Îraqê de milk, mijareke tevlîhev e, û gelek lihevnekirin vedigerin ser dema berî deh salan a hikûmeta Bes’ê ya Sedam Hiseyînê serekdewletê berê, ku ew li bakur têkoşîya ku pirrbûna ‘adetî ya Kurdan bi ya nîjadî ya ‘Ereban bi zorê veguhêze. Lêbelê di nava salên 2014-2017ê de krîza bextxwazan a li dora herêmên di destê DAÎŞ-ê de van qayîşkişandinan gihandiye asteke nû, ji ber ku malbatên Fileh ên dixwastin vegerin malên xwe dîtin ku hin Erebên Sinnî yan jî Kurd bûne xwedîyên milkên wan.

Herweha hikûmeta Îraqê hê jî nehiştiye ku kom û kesên din bawerîyên xwe bi serbestî bidin der û bijîn. Qanûnê Kardê Nasnameya Neteweyî yê 2015ê ji bo kêmanîyan hê jî teşqele ye: Madeyê 26ê ferz dike zarokên ku yek ji dê û bavê wan Misliman be, wek Misliman bên binavkirin. Sînorkirinên wek kesên ku ji Mislimantîyê derbasî dînekî din bibin û nikaribin dînê xwe bi nav bikin jî tên bêtirkirin. Serekên Fileh gotine ku zarokên malbatên Fileh ên ji ber hinek awayan berê wek Misliman hatine tomarkirin lê ew bixwe Fileh in, ji bo ku zarokên wan wek Misliman

neyên tomarkirin yan ji bo ku di tomarên fermî de neyên tomarkirin, direvin. Digel ku birêvebirîyên Îraqê yên ji 2015ê ve desthilatdar in, car caran soz dane ku ew ê vî qanûnî dîsa binirxînin jî, ev qanûn hê jî di rewacê de ye. Di vê navberê de dewlet, li kesên ku Xwedênenasîya xwe dîyar dikin doz vedike; wek nimûne di Nîsana 2018ê de ji bo çar kesên weha bi gunehbarîya "belavkirina ramana nebûna Xwedê" ji dadgehê emrê girtinê hatiye derxistin. Di meha Çileyê pêşîn de Alîkarê Wezîrê 'Edaletê Huseyn Elzuheyrî, di dan û sitandeneke li Encûmena Rakirina Heml û Meyla Nîjadî ya NY de di ramana xwe de israr kiriye ku Bahaîtî dînekî rewa nîne. Balê kişandiye ser Qanûnê jimara 105ê ya di 1970yî de yê ji alîyê hikûmeta Be'sê ve derxistî ya çalakîyên Bahaîyan ên li welêt qedexe kiribû.

***Teşqeleyên li HHK:*** Herêmên di destê HHK de piştî dewra tundîya mezhebî ya 2003ê û di dewra krîza DAÎŞ-ê ya paşîn de ji bo kêmanîyên nîjadî û dînî bûye cîhê bextxwazîyê û destûrdarên HHK, ji bo ku herêmên di destê xwe de wek bihiştên xweşbînîya dînî û nîjadî nîşan bidin, gelek têkoşîyane. Piştî bipêşveçûyîna DAÎŞ-ê gelek endamên komên kêmanîyan, ji ber ku birêvebirîya Îraqê guh nedaye wan, bi saya mekanîzmaya biryarsitandina HHK û birêvebirîya herêmî, revîyane van herêmên ku li wan biqedîr bin. Piştî giştpirsîya bêşans a bi azadîya Kurdan ve têkildar, berî 2017ê ku di nava Bexda û BHK de şer derkeve li BHK azadîya dînî hinbihin fireh dibû û digel vê yekê ji wê demê ve nîşanên tengbûnê jî xuya nebûne.

Lê dîsa jî li herêma BHK hin tengasîyên rewa û dewamkirî yên komên kêmanîyên dînî bi wan re rû bi rû ne hene. Yek ji teşqeleyên herî mezin; her wek teşqeleya li herêma di destê HFÎ-ê de derketî; nelihevkirinên li ser erdan in. Di rewşa Îraqê de nasnameya dînî û nîjadî gelekê caran ji bo seranserê nifşên bêjimar, bi gundekî ku ji komeke Filehên Keldanî yan malbateke Şebekê Mislimanê Şî'î re bûye hêlîn yan wek perestingeheke yan devereke civatî ya pîroz a ji bo Êzîdîyan cîhê di rojên pîroz de lihevkombûnê ve girêdayî ye. Nexasim di vê rewşa desthilatdarîya bakurê Îraqê de kontrola li ser van axên weha awayê nihêrtina van lihevnekirina xwedîtîya van axan a destûrdarên dewletê dikare bandorê li ser komekê bike ku hestên wê komê xwe wek qebûlkirî yan biyanîkirî bibîne. Nemaze komên Fileh gotine ku di her rewşê de nînbe jî gelekê caran di dewra herî pirr a krîza DAÎŞ-ê de dest hatiye danîn ser ax û xanîyên Filehên Wîlayeta Dihokê ya ew ji wê bi awayekî demkî dûr ketine. Herêma di destê HFÎ de çawa be, dibe ku ev teşqele ji ber gendelîyên bi dehên salan e dewam dikin, lihevnekirinên ji ber nasnameya nîjadî ya tevahîya welêt û tomara axê ve girêdayî û hin zehmetîyên din ên berî avabûna xweserîya heyî ya bakurê Îraqê nîşan bide.

## Siyaseta DY

DY ji bo krîza dînî û nîjadî ya kêmanî bi wan re rû bi rû mane hin tedbîrên gelek giring sitandine. Berî her tiştî, Acansa Geşepêdana Navneteweyîya DY (USAID) da zanîn ku ji 75 milyon $ê wê ji bo destekkirina alîkarîya bi dîsa avabûna îstîqrara Îraqê re veqetandiye ew ê 55 milyon $î bi taybetî ji bo destekkirina komên weha di Çileyê Paşîn ê 2018ê de bi rêya

Bernameya Geşepêdana NY (UNDP) bi kar bîne. Di Çîrîya Pêşîn de Wezîrîya Derve ya DY da zanîn ku ew ji bo heman amancan 178 milyon $ê din jî hatiye veqetandin. Cara paşîn di Çîrîya Paşîn de Kongres H.R. 390ê buhurand ku Serek Donald J. Trump meha dû re wê îmze kiribû û xistibû rewacê ku wek Qanûnê Berpirsîyarîya Azadkirin û Berpirîyarîya Tovkujîya Îraq û Sûrîyeyê ya 2018ê tê zanîn. Ev qanûn daye zanîn ku "DAÎŞ ji tovkujîyê, sûcên dijî mirovan û li Sûrîye û Îraqê sûcên zordestîya ser komên dînî û nîjadî yên wek Filehan, Êzîdîyan û Mislimanên Şî'î berpirsîyar e." Ji bilî van, ev awa berê hikûmeta DY daye wî awayî ku ew alîkarîya "pêdivêyên mirovahîyê, îstîqrarê û çêtirbûnê" pêk bîne û hikûmet û dezgehên civata sivîl karibin endamên DAÎŞ-ê ji ber sûcên li jorê xuyandî bikin berpirsîyar. Ev tedbîr ciddîbûna siyaseta DY û alîkarîya pereyî ya ji bo çaredîtina bandorên sosretên nîjadî û dînî yên di nav vî çend salên paşîn de li Îraqê rû dane nîşan daye.

Berî demekê komên alîkarîyê û serekên dînî yên Îraqê endîşeyên xwe dabûn der ku beşekî hindik ji fon û tevgeran digihîjin komên Îraqê yên xwedanpêdivî. Lêbelê nexasim Michael R. Pence-ê Alîkarê Serekdewletî bi alîkarîya hevkarîya bi dezgehên bawerîyê û yên herêmî, alîkarîya derve ya DY bêtir kiriye û bi mijara ku alîkarî bigihîjîn cîhê xwe, bı destekkirina kêmanîyên nîjadî û dînî yên bindest re bêtir têkildar bûye. Pence-ê Alîkarê Serekwezîrî di Temûza 2018ê de di Kombûna Fermî ya Belavkirina Azadîya Dînî de ji bo alîkarîya bi qurbanîyên zordestîya DAÎŞ-ê re tevgereke DY daye zanîn û ev tevger kiriye ku bernameya USAID-ê ya Azadkirina ji Tovkujîyê û Bersivdayîna Zordestîyê (GRPR) bikeve rewacê û kiriye ku alîkarîya tevahîya ji bo kêmanîyên bindest ên nîjadî û dînî bûye bêtirî 239 milyon $an. Ji bilî van, Michael R. Pompeo-yê Wezîrê Derve ji bo birêvebirina bernameyên alîkarîya kêmanîyan Max (Maks) Primorac-î wek nûnerê taybet kiriye postnişîn û di Balyozxaneya Tevahîya DY ya Hewlerê de di Çîrîya Pêşîn de wezîfedar kiriye.